

Kiriyariya Roja Nû; ji bona erdên Sûriye û Libnanê; 10 lîreyên Sûrî; ji bona welatên din 2 lîreyên îngilîzî. Bihayê Hejmarekê: 10 Qemerî.

ROJA NÛ

XWEDÎ Û GERÎNENDE: MÎR Dr. KAMIRAN ALÎ BEDIR-XAN

Dîwan û gerîmendekariya Rojname: Bêrût-Birc; We. qif Tabet, Telefona Dîwanê: 74-04; Telefona Mala Xwediyê Roja Nû: 84-41. Edresa telg: Bêrût-Rojant.

MERHELE

Di jîfina miletan de merheleyin bene û miletê ko dixwaze bigehe tekûz û medeniyetê û wan li xwe bike, jê ra divê bide reya wan merhelan û bi wan ra derbas bibe.

Gelo miletê Kurd daye pey wan merhelan û heke daye fro gihastîye kêjanê.

Delêletên heno ko miletê me berê xwe daye vê reyê û bi gavine giran, bi gavine giraniyê tê re diçe.

Heye ko hon bibêjin ji miletê me re, ji miletekî bişûndemayî re, ne gavîne giraniyê lê gavên çargaviyê gerek in, da ko ew xwe di ser-marhelan re zer bike û rojê berî rojê xwe bigehêne miletên ko di vê bezê de, jê derketine û ew bi şûn de hiştine û ji ber vê bişûndemayîne miletê me bindestiya wan dike û em bûne rajorên wî. Heke we holê got em jî bi we re. Lê ev, tiştê gerek e û tiştê gerek xwerû daxwaz e; û ne tiştê destxistî ye.

DAXWAZ Û TIŞTÊ HAZIR

Belê daxwaz ev e, lê tiştê hazir û mewcûd bi awakî din e û silaw li sîfira hazir e. Berî sê sed salî Ehemmed Xanî nav di miletê xwe dida û digot:

Enwa'î mîlêl xudan kitêb in
Kurmanc bi tenê di bê hesêb in.

Herç Evdilqadirê Koyî, di pey Xanî re û berî 50-60 salî, gava temaşa dinyayê dikir û didît ko her tiştên dinyayê guhêrîne û ji xwerdîne re jî awayîne nû çêbûne û bi tenê, bi xwendîna medresan berê Kurdan naçe şerî; dinalî û digot:

Le dewrî ême roman û cerîde
Egerçî meqsed e zîmanî baw e.

Belê Xanî digot «Bixwînin»; Koyî li gora wextê xwe, bi ser vê zêde dikir û digot: «Bi awayê nû bixwînin». Lê me ne xwend, gelo çirê? Ji ber ko mezin û birewerên kurdan menfehêten xwe ên «xasî di ser menfeheta mîlet re girtine; ev mîletê belengaz wek kerîkî pez dane ber xwe, ew dotîne, ji şîrê wî rûn û mast û penîr, ji hirîya wî xestanine teylesan çêkirine. Xwedê gunehên wan bixesîrine. Tiştê ko yar û mezinên me kirîye ev e. Lê rojêkê derba neyaran em hişyar kirin. Bi vê derbê me bîra her tiştî bir. Me zanî ko xweserîya me, di zîmanê me de ye û em bi tenê bi hînbûna xwendin û nivîsandîna zîmanê xwe û bi parastîna wî, di civata mîletan de, wek miletekî xweser dikarin bîjin û pâyedar bibin. An ne em jî dara heyîna mîletên çarnîkar re dibin xuşkî, di rayên wî de digerin û wê xurt dikin. Ji ber ko em bi xesalêten xwe ên tebîî ji wan xurtîr, zeximtir û paqijtir in. Şûr bi qencya folayê xwe dibire û diçirise.

FRENDA U CIVATA MILETAN

Frensê xwe ji civata Miletan bişûnda ne kişandiye. Londre — A. F. I. Sermiyanê Frensa Şerevanî General De Gol bi navê xwe û li ser Zîmanê General Jiro, ji civata Miletan re, li Jenevê da zanîn ko Frensê xwe ji vê Civatê bi şûnda ne kişandiye û mîna berê lebata civata Miletan e.

BOMBARDIMANA ESSENÊ

Stokholm:— R. Rêwingiyên ko bajarê Essenê, piştî bombardîmanên refên britanî bi çavê xwe dîtine, çîşe dikin û dibêjin: Essen ew şaristana elemapî a mezin, êdi ne bajarê kaviî û xerabezarek e, û xesarên ko gihane wî, ji yêna ko berî bi sê salan giha bûn Londrê, bi deh caran bêtir in.

Elemana di nav avahiyên febrîqan de dîwarîne stûr çêkirî bûn, da ko der dema bombardîmanan, avahî hemî bi hev re me kevin perşaniyê; le belê ew bedenên stûr, di bin xurtiya teqandîna bombeyîne mezin, her yekê ji wan du hezar û çar hezar kîlo giran, mîna pelên daran weşiyane, Iro ji karxaneyên Essenê ên mezin û bilind, bi şûndemayî binyadên dîwaran û kaviî û xirban e.

Ev mehek e di Essenê de kar û xebat sekiniye. Kes na şixule û nivê xelken vê şaristanê, dev ji mal û milkê xwe ji kar û destxetên xwe berdane û ketine rîya mihaciriyê. Bombayên britanî koka her du stasyonên Essenê jî rakirine.

Piştî bombardîmana vî bajarî, bi tometa anîna talanê xelkê 4 xebatkerên elemanî û pênc ji yêna biyanî, hatine bi dar ve kirin. Du rencherên elemanî yêna ko çavtirsîyandî bû bûn û ne dixwestin dest bi paqijîrîna xirbeyan bikin hatine mirandin.

Ji dikanên vî bajarî 500 heb hilweşiyane û zad û zixfreyên tê de xira bûne. Niho di Essenê de ji esker û peyayên ko bi emrê hîku metê avahiyên xesardîf hildîweşînin û dikin ava bikin pê ve kes ne maye.

CIHABA BRITANYA MEZIN

Londre — R. Hikûmeta Britanî duhî bi awakî resmî da zanîn: Li gora raporên ko digihin hikûmeta Britanya Mezin, eleman hazîriya xwe dikin û di eniya Şerê Rûsî de, bi gazên jehrîn emel bikin. Heke elemana ev tişt kir, diwê ew bizanin ko herveklî serekwezîrê britanî Mr. Çorçil elam da bû, qîwetên Hevalbenda di bombardîmanên qerargehên eskerî, merkeza febrîqeyên çek û posatên serî û bender û hejagehan de û hema, bi vê gazê de emel bikin.

Ordîya azahî û serbestiyê

Cezayir:— A. F. I. Radyoa Cezayirê duhî êvarê elam dida: Leşkerên frenzî yêna Ordîya Azahî û serbestiyê a mezin berê xwe daye Tûnis û Bizertê û pêş ve dikave. Yekîniyên dijîmîna ê dawîn wex'ekî nîzing de, ji erdê Efrîqayê de bêne qewirandin. Armanca yekemîn Ewriya ye. Hevalbenda nîzafkî Ewriyayê dibin û ala felat û serbestiyê bi xwe re tînin.

DESTGEHÊN EMERÎQANÎ 1265 WAPOR ÇÊKIRINE

Nû-York—R: Destgehen emerîqanî ji destpêka şerî û heta niha 1265 waporên bar û eskerkêş çêkirine.

Londre—R: Refên britanî bê etlahî dirêjî erdê germanîstanê dikin û bajarên elemanî ên tîr destgeh û febrîqan didin ber bomban û li hejagehên eskerî dixin.

Di nav wan rejên dawîn de, 600 bombeavêjên britanî dirêjî karxaneyên Skodayê kirine û 150,000 kîlo bombe avêtine wan febrîqan yêna ko li ser hesabê elemana tang, topên mezin, gule, otomoblên zirhkirî, balafir û motorên gir û hûr çê dikin. Di febrîkêyan Skodayê de 55,000 peya dixebitîn.

Lê fola tê de wînda ye; nav navê şîr û yê xwediyê wî ye.

Belê, me her tiştî bîr birîye û fro gava em li hev digihin hev, bi ax û nalfn, ji hev û du re dibêjin:

«Bavol li dinyayê ji me kêmtir kes ne maye. Heçî mîlet hene tev de bûne dewlet û hikûmet, xudan kitêb û dibistan. Bi tenê em, mîletê kurd; bi şûn da mane; reben, feqîr, nezan, belengaz, di destên xelkê de lehîstok. Xelkê hevşara me kirîye destê xwe, li gora kêf û menfeheta xwe berê me jî bakur

dîde nîvro, ji roavê dîde rohelê. Ji lewre divê em jî bixebitîn xelkê xwe hîfî xwendin û nivîsandîne bikin, vî mîletê belengaz ji tarîtiyê xelas bikin, berê wî bidin tav û ronahiye.

Li ser vê gotinê jî em yek in. Lê...

KIRIN Û GOTIN:

Lebelê, ji ber ko kirin û gotin ne birayên hev in, di dema kirinê de; destekî xedar me ji hev dike. Wextê gotinê ye. Em sed peyan in. Di gotinê de em ji hev derdî-kevin. (Li rapela diwemîn hinêrin)

DURIK

Dûrikên li ber tenbûrê

MAM DELALÊ

Çi şikefta dev mezinê
Jê revîya refek jînê
Çavê min li a mezinê.

Çi şikefta dev li hewa
Jê friiya refek kewa
Çavê min li a bedewa.

Çi şikefta dev biçûk e
Jê friiya refek bûk e
Çavê min li a biçûk e.

Sibe bû, min karek ne kir
Destê lêwik qîpçe kir
Sê siwara xuyayî kir

Min go siwarîno hon kî ne?
Go xwakê em xerîb ne
Xwakê em rêwî ne.

DILO

Lo dilo! Hey lo dilo!
Xelkê me çû bûn çîlo
Dinya hemî zewicî
Ez û gewrê man wîlo.

Sîng û berê te gewr in
Mîna dimis û fro
Li ser destê xwe kiro
Mîrê Bota re biro.

Lo dilo! Hey lo dilo!
Agir ket sîncî reza
Ketî bû hexcê gula
Ezê biçepî te bigrim
Bavêjim taxa îla.

EDLÊ

Edlê rabe sibe ye
Dengê dîkan çêbe ye
Çax, çaxê min û te ye
Çaxê nîmêja te ye

Hey lê, gidîyê Edlayê
Bê sozê, sozwindayê
Malê dinyê hindikê
Qelena gewra min nayê

Sibe bû, dîka qîr kir
Cotkariya nîr li pî kir
Rêka şikeftê d' nîvî kir
Sînga gewrê sipî kir.

Heylê gidîyê Edlayê
Min sozek bi te re dayê
Ez tu car na dim terkayê
Heta bi axa merzela
Heta bi kêlê kevîrê
Bi şîngîna berê hesînî

Mala Edlê li neqebê
Lê hat bakî zezebê
Kul li Edlê giran bû
Da ser derdê kezêbê

Mala Edlê li jor e
Dergûşê lor e lor e
Hêvî ma rebê jor e
Ezê bi çepî te bigrim
Bavem welatê jor e.

Dê Edlê! rabe, rabe
Dil ketîçare nabe
Kes li malê tu ne ye
Kêf, kêfa min û te ye!

MAMIK: Av e, ne av e, marê mirî di nav e, teyrê zêfîa hindav e. Qesra spî bê çerî.

DEMA DAWIN

Londre—R: Emfraliya britani dide zanin: Noqavên britani di Behra Spî de ji nû ve 21 vaporen Mihwerê bin av kirine; û xesar gihandine heft hebên din.

Londre—R: Refên Britani torpil reşandine behrên dijiman.

Londre—R: Di eniya şerê Tûnisê de pêşveçûna leşkerên hevalbendan dom dike: her çend ji qiwetên Mihwerê berêrî an dikin.

DI ENIYA TUNISÊ DE

Londre: — R. Di eniya Tûnisê de qiwetên, Mihwerê şerên xwe ên dawîn dikin; şerine bê hevî û niyaz. Ordîyên Britani, leşkerên frensî û baskordîya emerîqanî a diwemîn di tevayîya qadên şerî de zora xwe didin qiwetên Mihwerê.

Nû-Delhi— R: Di eniya şerê Arakanê de topçiyên her du alîyan li hev û du xistine. Qiwetên britani û japonî gelek caran dirêjî hev û du kirine, lê rewîşa eskerî ne guheriye.

SERFERMANDARIYA SOVYETI DIDE ZANIN

Moskû: — A.F.I. Danezana sovyetî a nivê şevê elam dide: di tevayîya qadên şerî de rewîşa eskerî bi awakî heja ne guheriye. Qiwetên me di Behra-Reş de, waporeke elemanî a barkêş xerîqandiye.

Refên me di eniya şerî de 5 tangên elemanî şênandine, û 30 qamyon teji esker an çek û posat dagirtî xira, 3 depoçebilxane berhewa û 15 betariye top lal kirine.

Di erdê Kuban, Rostov, Balaklaia û di eniya roa vavî de, leşkerên me zehf eper û asegehên elemnana vegirtine û xesarine dijwar gihandine wan.

GENERAL EISENHOWER

Londre— R. General Eisenhower di civana rojnamevanan de gotiye ko noqavên britani û yên hevalbendan di Behra Spî de, milyonek ton vaporen neyaran bin av kirine.

MERHELE

2

Şexalî li ser «divêtê»ye. Divêt holê bikin; divêt holê bêtê çekirin. Ji vî sedî her yek ji ê din xurtir û zeximtir e. Wextê kirinê ye. Ji wî sed peyayî anax deh peya mane. Ma çire?

Niho ezê rê bidim peyayên ko ji kirinê xwe dane paş. Ew du sebebên şanî me didin û dibêjin:

1— Tu tişt ji min nayê, ma xwendina min ji çî ye ko ez bikarim bi kêr bêm . . .

2— Ma tu nabînî, herkes neyarê kurd e. Tukes arîkariya me nake. Siyaseta dewletên ewropayî ên mezin hero bi awakî ye. Ji bo xatirê milletên din rûyê xwe ji me badane.

Ji aliyê kirdê ve, di van gotinan de tiştên rast; heqîqetîne eskerê hene. Lê ev tişt nikarin me ji xebata xwe a edebî bi şûn da bîhêlin.

Niho em li wan vedigerînin û dibêjin: Di xebata me ya fro de heçî divê û di xwe re dibîne dikare bi kêr bê. Çawan?

Bi hînbûn û hînkirina elfabeya me. Yê ko bi sih û yek tîpên kurdî dizane, ew kes mamosteyek e. Ji xwe tiştê ko fro ji me re divêtin mamoste ne, mamosteyên gerok yên ko tîpên me di nav millet de belav dikin, xelkê hînkirî xwendin û nivîsandinê dikin.

3— Rast e ko siyaseta dewletên mezin hero bi awakî ye û gelek caran ew siyaseta ne bi daxwaza me ve ye. Bivê nevwê ew siyaseta bi me re biva karê me gelek hêsanîtir dibû û wî karî zûka fêkiyê xwe dida. Lê rexma ko ew siyaseta ne bi me re ye, wê siyaseta tu caran xwendin û nivîsandina zimanê me bend ne kiriye. Heye ko nîmîndeyên wan dewletan nav di me dane û gotine: Bixwînin û xelkê xwe bi xwendin bidin.

Heke em li hêviya arîkariya dewletan mane Xwedê dizane ew

REŞBELEK

— Ji xortên Cezîrê re —

Gerçî ez dûrî we me, fro, erê. Lê bi dil ez ba we me, mîna berê.

Hûn dizanin ez ji bo çî dîr ketim, Herçî zana dizane vê xeberê.

Ez evîne şekirê Şamê ne bîm, Lê ji ber jana ku dabû cegerê.

Ez hevalê we me, ger dûrî we bîm, Para min bêtir dibe ji kederê.

Yek roja ku min bi wer' derbas dikir, Ne dîant bîra min salê herê.

Yek nêrîna Mêrdîn û Burca belek, Bi Xwedê nadim bi «eswed hecer» ê.

Neynûka yekî ji we na guhêr im, Bi hezar «Zêd» û bi hezar «Ûmer» ê

Ez glî û gazinan ji kê bikim? Nijdevanê me bû bûn swarê kerê,

Lê bizanin rojeke min ji heye, Qelema niştir ji kalan ê derê.

Hingî hîsabî û kitab têtê kirin Ji cewrên wê dêlika derbederê.

18-3-943 QEDRÎ-CAN

arîkarî kengê têt. Heye ko yekcaî nayê. Ji lewre û herwekî medhelokê gotiye. Şer bi lepê xwe, Şêx Adî nayê hawara te.

Herçî merhela ko em fro têtê de ne, merhela «a» û «bê» ye. Lê heke me dil kir, em di vê merhelê re zû dikarin derbas bibin. Ji ber ko hînbûna a û beyên me, ji mehekê bêtir najo.


XWENDEVANÊN DELAL halê me kurdmancan ev e. Û edî şûc [ne yê beg û şêx û axalera, lê yê mineweran e. Ji lewre em gazindan xwe ji wan dikin. Herçî beg û axeler heke ew bixwazin ji li ber xebata mineweran rabin, nema ji wan têt. Ji xwe birekî wan hevalên mineweran in û bi wan re li hişyariya millet dixebitin.

Mîna Mela Enwerê ko li Amêdiyê sûxteyên xwe hînkirî tîpên kurdî dîke.

Çeladet Ali BEDIR-KHAN


MIREKA CIHANE

MIREKA CIHANE MIREKA WENEYÊN ŞER û AŞIYIYE




MAREŞAL JOFIR WAPREKE FRENSIZI

Yekîniye mezin ji stola Frensa Serevani a bar û eskerkêş,




QESRA HIKÛMETÊ LI NÛ-DELHIYÊ

Ji bergehên Şarîstana Nû-Delhiyê- axa Hindîstanê — Ev qesra çeleng û spehî çîredestê qesirbendê îngilîzî ê mezin Sir Edwin Lutyens e



VEDETÊN EMERIQANÎ EN TORPILAVEJ

Ev gemiyên biçûk ji bona vaporen neyaran talukeke mezin in; ko torpîleke wan rast bi rast li armencê ketiye; ev derb besî binavbûna wapreke yê



IBADETGEHEK JI YÊN INGILISTANE

Ibadetgehek ji yên erdê Ingilîstanê. Avahiyeke stûr û qaîm in; kubarî û bedewiya wan bi nav û deng e

LE JOUR NOUVEAU

Direction: Beyrouth Vekfs Tabet
Place des Canons Tél. 74 04 et 84-41

QUOTIDIEN KURDE
Directeur - Propriétaire: EMIR Dr. KAMURAN AALI BEDIR KHAN

Le Numéro 10 P.L.S. - Abonnement
Syrie-Liban 10 L.L.S. Etranger 2 L. Stg.

ROJA NU (Le Jour Nouveau)

Roja Nu ! le Jour Nouveau !

Ce titre à lui seul est un programme qui emprunte à la période de l'année qui le voit naître son caractère et ses promesses.

Ce quotidien voit, en effet, le jour à l'époque printanière où les germes des plantes prennent une vie nouvelle, où le cœur de l'homme s'ouvre à l'espoir, où la pensée sent se renouveler ses forces créatrices.

A quoi vise, en effet, cette publication ? A former le peuple Kurde en lui donnant des nouvelles venues des diverses parties du monde. A mettre à portée de la masse kurde les trésors d'une littérature qui n'a pas attendu à aujourd'hui pour traduire la magnifique énergie de tempéraments entiers s'exprimant à la fois dans l'amour et dans la guerre.

Depuis quatre siècles déjà la littérature kurde a servi d'instrument à toute une pléiade de poètes classiques parmi lesquels les noms de Melayé Djezîrî, Ahmedé Khanî, Siyehpouche et Akhayok sont restés les plus célèbres et les plus vivants.

Mais ce lyrisme vigoureux qu'exprimait la langue écrite restait en grande partie la chasse gardée d'une élite cultivée dont l'entrée demeurerait interdite à la masse illettrée.

Et comme d'autre part un grand peuple à la pensée vigoureuse aux sentiments virils ne peut pas se passer de littérature, le peuple versa le trop plein de son âme dans un folklore d'une richesse dont les « Textes Kurdes » traduits par Mr. LESCOT et publiés par les soins de l'Institut français de Damas, peuvent seuls donner une idée à ceux qui n'ont pas l'avantage d'en connaître la langue.

C'est la tradition orale qui a permis à ces poèmes en vers libres de parvenir jusqu'à nous.

Nés dans le peuple et non écrits, ces poèmes ont gagné en profondeur et en vigueur le développement qu'ils ne pouvaient atteindre en surface.

Moins connus, ils restèrent plus purs et ne subirent pas les influences arabes et iraniennes qui dans une certaine mesure altérèrent les œuvres classiques écrites en caractères arabes.

Ils traduisent ainsi plus exactement et plus sûrement l'âme même du peuple. De la outre leur incontestable valeur esthétique, l'intérêt historique, psychologique et pratique qu'ils présentent.

A l'époque moderne, cependant, où la force de la transmission orale fléchit sous le poids du papier imprimé, il convenait, si l'on voulait que ces joyaux demeuraissent, d'en chasser pour les siècles à venir, le

LES DEPECHEES de la NUIT

Londres 3 (R) — La première Armée Britannique a réalisé une nouvelle avancée de plusieurs kilomètres le long de la route de Tebourba. La bataille fait rage en ce moment pour la possession définitive du Djebel Rou Aoukaz.

Au sud de Mejez el Bab les troupes britanniques ont repoussé 3 contre-attaques allemandes. L'ennemi continue à subir la pression des forces alliées qui ne laissent aucun répit.

Moscou 3 A.F.I. — Le Communiqué de minuit déclare que 281 avions allemands ont été détruits en combats aériens au cours de la semaine qui vient de s'écouler. Les pertes soviétiques durant cette même période se sont élevées à 106 appareils.

Des unités de surface soviétiques ont coulé un transport ennemi dans la mer de Barentz.

Le Communiqué ajoute que dans la région de Novorossisk, les Allemands ont déclenché, il y a quelques jours, une offensive vigoureuse à l'aide d'effectifs considérables. Protégés par leur aviation, les Allemands ont attaqué 6 jours durant, s'efforçant de briser la résistance des Russes. Tous les assauts ennemis ont été repoussés et de lourdes pertes ont été infligées aux troupes allemandes et roumaines. Plus de 7.000 soldats et officiers ennemis ont été tués; 25 tanks et autos-blindés ont été incendiés, l'ennemi, épuisé par ces tentatives a renoncé à l'attaque.

Sur le front central, les Russes ont liquidé plusieurs détachements de reconnaissances ennemis.

A l'ouest de Rostov, échange de tirs d'artillerie.

Londres 3 R. — Des bombardiers lourds américains ont attaqué dans la journée

de Samedi le port de St-Nazaire. Plusieurs avions ennemis ont été abattus au cours de cette opération qui s'est déroulée dans de mauvaises conditions atmosphériques. 7 bombardiers sont manquants.

Washington 3 (R) — Le Département de la Marine communique que les sous-marins américains patrouillant dans le Pacifique ont coulé jusqu'ici plus de 125.000 tonnes de bateaux japonais, depuis le commencement de la guerre.

Washington 3 (R) — Le Département de la Marine communique que l'aviation américaine a bombardé les positions japonaises à Minda dans le secteur central des Iles Salomon.

Dans le secteur nord du Pacifique deux attaques ont été effectuées contre les positions japonaises de Kiska.

Nouvelle Delhi, 3 (R) — Le Q. G. américain annonce que l'aviation américaine a bombardé l'aérodrome japonais de Pagoda, au sud de Rangoon. Des coups directs ont été observés sur les pistes d'envol.

D'autres formations de bombardiers américains ont attaqué des installations ferroviaires ennemies dans la région de Mandalay.

Stockholm, 3 (R) — Le général Jani, Commandant en Chef des troupes hongroises a déclaré officiellement que les forces hongroises se concentreraient sur la défense de leurs frontières nationales et ne prendraient plus longtemps part aux opérations sur le front de l'est.

Alger 3 (R) — Radio-Alger annonce que les unités de la 2^{ème} Armée Américaine opérant dans le secteur nord de la Tunisie ont atteint un point situé à 20 kms. de Mateur.

LE NOUVEAU PORTE-AVIONS BRITANNIQUE L'«INDOMITABLE»

Londres. — A.F.I. On vient de publier des précisions sur le nouveau porte-avions britannique l'«Indomitable», qui appartient à la classe de «Illustrious». Il jauge 23 mille tonnes et transporte des escadrilles de bombardiers-torpilleurs, des appareils de reconnaissance et les Spitfires destinés à la mer.

On ne dit pas combien l'«Indomitable» peut transporter d'appareils, mais il est plus grand que l'«Ark Royal» qui pouvait en prendre un maximum de 60. L'«Indomitable» a un armement défensif de 16 pièces de 4 pouces et demi et de nombreuses pièces de plus petit calibre.

Ce navire a déjà participé à de nombreuses actions, notamment il a transporté à Ceylan les *Hurricane* qui étaient anxieusement attendus pour cette île qui s'attendait à un débarquement japonais. Les *Hurricane* arrivèrent à temps et les avions japonais qui devaient frayer la voie aux troupes d'invasion furent taillés en pièces.

C'est en août dernier que l'équipage de l'«Indomitable» entra pour la première fois en action, pendant la bataille que livra le convoi qui transporta à Malte du Ravitaillement de la plus haute importance. Le pavillon du vice-amiral Lyster flotte sur l'«Indomitable». Celui-ci est le pionnier du mouvement en faveur de l'emploi d'appareils à grande vitesse sur les porte-avions. Des appareils spéciaux permettant l'atterrissage de ces avions ont dû être construits pour cela.

verbe sonore dans l'écrit qui le fixe.

C'est ce que comprennent les Emirs Bedir Khan qui conscients des nécessités modernes et pour atteindre plus facilement leur but décidèrent en 1919 de choisir pour traduire leur langue un alphabet latin.

Ils ne faisaient ainsi que se conformer à l'évolution historique des langues aryennes dont le kurde est un rameau au même titre que les langues latines, slaves ou germaniques.

Ils faisaient plus encore. Ils mettaient à portée de la masse un véhicule littéraire qui pouvait servir à sa formation et à son développement en conformité avec les nécessités du siècle.

Vrais chefs en cela, restés dans la meilleure des traditions aristocratiques, ils ne pensaient pas qu'une élite cultivée dût vivre repliée sur elle-même en faisant abstraction des sentiments et de l'existence de la masse qui l'entoure.

Le chef doit conduire: il doit donc s'efforcer de faire comprendre à ceux qui le suivent ce qu'il convient de faire.

Et si de tous temps la place des chefs fut en tête des troupes dans le fracas des batailles, elle est aussi et plus encore peut être en tête des mouvements de pensée susceptibles de conduire l'humanité vers plus de bonté, plus de justice et plus de vérité.

RENÉ BOISSEAU

VISAGE DE LA FRANCE

Peu de noms de pays évoquent pour les hommes du monde entier une silhouette aussi précise que celle de la France: peu d'ensembles politiques, intellectuels et moraux correspondent à ce que l'on appelle une nation sont aussi profondément enracinés dans un cadre aussi stable.

Les Grecs avaient déjà été frappés de l'unité géographique de cette partie de l'Europe et César assignait en gros à la Gaule les limites de la France de toujours.

Le principal caractère de la géographie physique de la France c'est LA MESURE. Tout y paraît être à la taille de l'homme; 550.000 km² au lieu des 20.000.000 de km² de l'URSS; une forme hexagonale qui fait qu'aucun point n'est à 500 kms. du centre et qui réduit au minimum la longueur des frontières; des terres situées de part et d'autre du 45^e et frappées de plein fouet par les courants chauds de l'Atlantique, ce qui fait que la Gironde ne gèle jamais à la latitude de Québec; une longue façade maritime sur les deux mers qui successivement et depuis la percée de Suez simultanément, ont été les plus grands centres de civilisation et de circulation du globe, des frontières limitées par les montagnes sauf malheureusement au Nord-Ouest où, comme le dit le Général de Gaulle «Se trouve l'infirmité séculaire de la Patrie». A l'intérieur de l'hexagone une heureuse répartition des plaines et des montagnes avec le magnifique châteaudeau du Massif Central facilement pénétrable et, aujourd'hui, distributeur d'énergie électrique.

Pas de fleuves géants mais des cours d'eau domestiques, aux colères rares comparées à celles des fleuves chinois.

Mais si le premier caractère de la France est la MESURE, le second en est bien la VARIÉTÉ. Les combinaisons du relief du climat et de l'hydrographie ont créé une multitude de pays qui se suffisaient à peu près eux-mêmes, ce qui explique la persistance d'un régionalisme puissant. Cela eût pu être un danger, la France aurait pu rester compartimentée comme la Grèce ancienne. Mais partout se trouvent des voies faciles de circulation générale qui ont empêché dès l'origine les pays de s'attarder dans l'isolement: L'Andorre, le Luxembourg et Monaco sont excentriques, l'autonomisme breton est un amusement d'intellectuels.

A cette terre, à leur mesure, des hommes venus de partout appartenant à toutes les races ont incorporé une prodigieuse quantité de travail. Ils ont défriché les forêts, endigué les fleuves, amélioré le sol; remué pendant 2000 ans tout ce qui était labourable. Peu de terres ont été aussi HUMANISÉES et, en faisant le bilan des avantages naturels de toutes sortes de la France, en admirant la réussite de la collaboration des hommes et du sol, un écrivain allemand s'écriait "Dieu est-il Français?"

E. B.

LA PRESSE KURDE

«Rojâ Nû», quotidien kurde... En lisant cette manchette, beaucoup penseront se trouver en présence d'une curiosité, dont la possession ferait le bonheur d'un bibliophile: le premier numéro du premier journal kurde. Qu'ils se détrompent. Le passé de la presse kurde est déjà long; elle pourra, dans quatre ans, fêter le cinquantième anniversaire de sa fondation.

En 1897, Midhat beg Bedir Khan inaugurerait au Caire la publication de son «Kurdistan», que son frère, Abderrahman beg poursuivit plus tard, d'abord en Egypte, puis en Suisse, à Londres, et à Folkestone. Lors de la proclamation de la Constitution de 1908, «Kurdistan» reparut à Stamboul même, sous la direction de Souraya beg, neveu d'Abderrahman, mais durant très peu de temps.

Par la suite, à partir de 1912, le «Hévi», qui groupait les étudiants kurdes de Constantinople, édita une revue mensuelle, «Rojâ Kurd» (Le Soleil Kurde), qui abandonna bientôt son premier titre pour celui de «Hetawê Kurd». Enfin en 1914, les missionnaires protestants d'Ourmia créèrent un nouveau périodique, «Kurdistan» qui n'eut qu'une durée éphémère.

La guerre mit pour quelques temps, un frein à cette activité littéraire, mais le mouvement était lancé. Dès 1916-17, Souraya beg Bedir Khan, reprenait, sous le pseudonyme de Ahmad Azizi, la publication au Caire du journal «Kurdistan». En 1919, le retour de la paix et l'espoir de l'indépendance encouragèrent les intellectuels à se remettre à l'oeuvre. A Stamboul même, quelques uns d'entre eux entreprirent la rédaction d'un hebdomadaire, «Jîn» (La Vie) qui, bien que de langue turque, travailla, durant quelques mois, à diffuser l'idée nationale kurde. Les éditeurs de «Jîn» commencèrent en outre l'édition d'une série de suppléments littéraires; ils durent malheureusement,

s'arrêter au premier volume. Cette plaquette, qui n'était autre que le «Memozîn» de Xanî, l'épopée nationale kurde, fut saisie par les autorités; il n'en subsiste actuellement que quelques rares exemplaires, sauvés de la destruction.

L'avènement du mandat britannique en Iraq permit à la presse kurde de s'épanouir à peu près librement dans les provinces de dialecte Sorani. A Suleimaniyé, à Kirkouk, à Rawandouz, à Arbil, et même à Bagdad, se fondèrent, entre 1920 et 1930, une quinzaine de journaux et de revues dont nous ne citerons que les principaux: «Pêskewtin» (Le progrès, Suleimaniyé, 1920-22), le premier en date, «Banê Kurdistan» (L'Appel du Kurdistan, Suleimaniyé, 1922); «Bang ê Haq» (L'appel de la vérité; Suleimaniyé, 1923), journal officiel de Şêx Mehmed, durant sa royauté passagère; «Jiyanewe» (La résurrection), qui devint un peu plus tard «Jiyan», tout court (La Vie), journal officiel de la municipalité de Suleimaniyé, dont le premier numéro date de 1924, et qui continue encore à paraître; «Zar ê Kurmançî» (La langue Kurde, revue littéraire, Rawandouz, 1926-32); «Diyariyê Kurdistan» (1925-6, Bagdad). On trouvera une liste complète de ces périodiques dans l'article de C. J. Edmonds, «A bibliography of Southern Kurdish, 1920-1936» (Journal of the Royal Asian Society, 1937, pp. 487-97). Enfin, un groupe d'intellectuels imprime, depuis 1939, à Bagdad, une excellente revue, «Gêlavêj» qui, grâce à sa tenue littéraire est certainement l'une des plus intéressantes de tout le Proche Orient.

Bien que ce soit en Iraq que la presse kurde ait trouvé le terrain le plus favorable à son développement, les périodiques qui paraissent dans ce pays ne semblent pas appelés à avoir, dans l'avenir, le même rayonnement que ceux qui s'éditent actuellement à Erivan, et surtout à Damas.

En effet, les Kurdes de Suleimaniyé sont restés, pour différentes raisons politiques et religieuses, fidèles aux caractères arabes, qui s'adaptent très mal à leur langue. Leurs compatriotes d'Arménie Soviétique et de Syrie ont adopté, en 1929 et en 1933, respectivement les systèmes graphiques plus modernes. Celui qu'ont imaginé les Kurdes de Russie est une transcription assez compliquée dans laquelle voisinent des caractères latins, arméniens et russes, mais qui tend à s'assouplir par l'usage. Purement latin, l'alphabet employé en Syrie est d'un maniement beaucoup plus commode; sa diffusion, chaque jour plus grande dans toutes les classes sociales, fait prévoir qu'il l'emportera définitivement, et à brève échéance.

A Erivan paraît, depuis 1929, «Riya Taze» (La Voie Nouvelle), quotidien d'information, contenant parfois des articles littéraires. Il n'a pas encore franchi les frontières de l'U.R.S.S.

A Damas, de 1933 à 1935, fut publiée la première série de «Hawar», d'abord simultanément en caractères latins et arabes, puis uniquement en caractères latins. Après une interruption de six ans, la revue vit de nouveau le jour en 1941. Son cinquante-quatrième numéro se trouve actuellement sous presse. La collection complète de «Hawar» constitue un incomparable instrument de travail pour quiconque s'intéresse au Kurdistan. Elle renferme en Kurde et en Français, la plus riche documentation littéraire, linguistique et historique qui ait encore été publiée sur ce pays. Elle permet en outre de suivre pas à pas l'évolution et les progrès de la jeune école littéraire kurde, grâce aux nouvelles de Bisarê Segman, de Qadrîcan, de Nûredin, aux poèmes de Cegerxwîn, de Hisyar, d'Osman Sebrî, de Ehmed ê Botî, et aux articles de Slêmanê Ferho ou de Dilawer Çarpîne, sans oublier le «Tefsîr» du Docteur Karamuran Bedir Xan, aussi subtil théologien qu'excellent écrivain.

Depuis 1942, «Hawar» possède un supplément illustré, «Ronahî»

POÈME KURDE

Traduit en vers libres

LA SECONDE

Comme les gouttes
D'une pluie torrentielle
Tombent les secondes
Et le fleuve de l'heure monte
Les jours vagabonds
Envahissent, inondent
Les plateaux
Des mois et des années.

La flamme terrible de la seconde
Brûla le corps des siècles
La cendre de cet autodafé
Couvre les pâles pages de l'histoire
Comme une légende et ses fées.

La fumée monte vers le ciel,
Vers le pays des étoiles;
La porte du soleil s'ouvre
Après l'orage,
On voit sur la terre sèche
Les sillons
Où passa le géant des âges.

DR. BEDIR KHAN

PROVERBES KURDES

Rien n'est plus faible que l'herbe, pourtant elle ne reste pas sous les pierres.

Longue route vaut mieux que tombeau profond.

C'est à dire: les entreprises dangereuses sont préférables à l'inaction.

Une main lave l'autre, les deux, le visage.

C'est à dire: l'union fait la force. L'âne a un mors et un licou, et l'homme, une parole et une promesse.

Le poltron meurt à chaque instant, le brave, une seule fois.

L'argent est un bon valet, mais un mauvais maître.

L'ennemi du père ne devient pas l'ami du fils.

Provisoirement, LE JOUR NOUVEAU paraîtra une fois par semaine, le Lundi.

(La Lumière), dont le succès ne cesse de s'accroître, tant en Iraq qu'en Syrie.

Souhaitons à «Rojâ Nû», troisième périodique kurde en caractères latins (en «lettres kurdes», disent les Kurdes), longue vie et pareille fortune.

ROGER LESCOT

LA MARINE DE LA FRANCE COMBATTANTE LA «MINERVE»

L'ouverture d'un sous-marin Français Libre
racontée par le commandant de la «Minerve»

Vers onze heures du matin nous nous trouvions à quelques centaines de mètres de la côte norvégienne du côté de Stavanger. On pouvait facilement voir les arbres et les rochers de la côte, par le périscope que nous utilisions et qui sortait à peine de l'eau.

Soudain je vis un grand bateau citerne sur lequel flottait la Swastika (la Croix gammée). Il était lourdement chargé et se dirigeait vers la côte. Sans perdre le temps nous lâchons nos torpilles. «Tûbe un et deux: Feu»

Un sillage argenté et une explosion. Les torpilles avaient atteint le bâtiment au centre et l'explosion formidable qui fit trembler la «Minerve» fut suivie d'une immense gerbe de flammes.

Je savais alors quel serait le sort de ce bateau citerne. Malheureusement c'est la «Minerve» qui, à ce moment-là nous donna un signal imprévu, car si

jetées furieusement dans une boîte en fer.

Heureusement nous pûmes plonger en moins d'une minute. Nous plongâmes d'ailleurs si vite que nous allâmes au fond comme une pierre.

C'est alors que la chasse commença, les grenades sous-marines et les bombes pleuvant sur nous. Nous avons compté que pendant les 40 premières minutes, il y eut en moyenne une explosion toutes les deux minutes.

Il est miraculeux, les Allemands nous ayant vus, qu'aucune de ces bombes ne soit tombée sur nos têtes. Le fait est que la «Minerve» fut secouée et trembla comme de la gelée, craqua et vibra comme une maison dans une tornade.

À ce moment, notre réserve d'air s'épuisait, la situation s'aggravait sans cesse, et l'atmosphère devenait de plus en plus dense et tendue. Mais il n'y avait rien d'autre à faire pour nous qu'à attendre. Nous entendîmes au-dessus de nous un bruit d'hélices, puis une explosion, de nouveau des hélices et une nouvelle explosion.

Celle-ci semble plus lointaine

nous distons-nous, pleins d'espoir. Les hommes transpiraient abondamment, respiraient lentement et ne parlaient pas pour économiser l'oxygène. Chacun écoutait, les nerfs tendus... Lorsque les souliers de l'un des hommes résonnèrent sur le plancher de fer, chacun protesta. Ensuite chacun enleva ses souliers. Je n'ai pas de mots pour exprimer la tension suffocante de ces instants. On priaît Dieu pour un peu d'air frais.

Pendant 13 heures, les bâtiments ennemis ont patrouillé au-dessus de nous. A la tombée de la nuit, il y eut une accalmie et nous pensions que c'était terminé, lorsque nous entendîmes de nouveau cet épouvantable bruit d'hélice suivi de trois explosions chacune plus forte que la précédente. La «Minerve» fut secouée avec violence.

Je plaisantais avec mes hommes, mais je craignais que la suivante de la série ne fût pour nous. Il n'eut pas de suite.

Quand tout fut calme, nous remontâmes à la surface. Le sous-marin était endommagé, mais nous pûmes heureusement regagner le port par nos propres moyens.